


**Dîrokvanê wêjeya Kurdî  
Kamuran Elî Bedirxan**



Yek ji pêşengên Wêjeya Kurdî Kamuran Elî Bedirxan ji beriya 45 salan li Fransayê koça dawî kir. Kamuran Elî Bedirxan bi xebat û têkoşîna xwe ya di warê ziman û wêjeya Kurdî de, navên xwe bi tîpên zêrîn di dîroka gelê Kurd de nivîsand.

Kamuran Elî Bedirxan di 21'ê Tebaxa sala 1895'an de jidayîkbûye. Kurê Emîn Elî Bedirxan û neviyê Mîr Bedirxane. Kamuran Elî Bedirxan li gel zimanê Kurdî ku zimanê dayîkê ye, xwe fêrî zimanên Erebi, Tirkî, Farsi, Elmani, Tirkî û Fransî dîke.

Kamuran Elî Bedirxan di dema perwerdeya xwe wek malbata xwe hertim di nava partî û saziyên Kurdî de cih girt. Bi vê yekê sinordar nema û di xebatên wêjeyî û zimanê Kurdî de bi awayekî çalak cih girt. Zarokên Emîn Elî Bedirxan; Bedirxan, Elî û Celadet Elî Bedirxan piştî şerê Cihanê yê Yekemîn xebatên siyasî xurt dikin û piştî têkçûna Împaratoriya Osmanîyan, ji bo yekitiya gelê Kurd xebatên dimeşînin. Piştî îlankirina Komara Tirkiyê bi cezayê darvekirinê têne cezakirin. Li ser vê yekê kurên Emîn Elî Bedirxan derdikevin dervê welat. Di vê demê de Kamuran Elî Bedirxan li Elmanyayê doktoraya xwe temam dîke. Di sala 1930'an de diçe Suriyê û li gel birayê xwe Celadet Elî ku di sala 1926'an de derbazî Şamê bibû xebatên siyasî û wêjeyî dimeşîne.

Kamuran Elî Bedirxan ji bo Rêzimana Kurdî xebatên Elfabeya Kurdî amade dîke. Di 15'ê Gulana sala 1932'an de bi pêşengtiya Celadet Elî Bedirxan û hewldanên birayên wî de, Kovara Hekar tê çapkirin.

**Hinek berhemên Kamuran Elî Bedirxan evin:**


Elfabeya Kurdî, elfabeya Min, waneyên şerîatê, hevokên hilbijartî, destpêka xwendinê, rêzimana Kurdî, zimanê dayîkê, ferhenga Kurdî, xwendina Kurdî, gotinên Kurdî – metelokên Kurdî, helbestên Kurdî, Der Adler Von Kurdistan, Aydınlık Kari û helbestên Kurdî (werdirxan û hewldanên birayên wî de, Kovara Hekar tê çapkirin. (bi raveyên Tirkî)

**Pirtûka 'Berxwedan' gihîşt ber destê xwendevanan**

Pirtûka 'Berxwedan' a rojnamevana Îtalyayî Laûra Schrader, ku li ser serpêhatiya aşti û berxwedanê ya 20 salên dawî ya Rêber Abdullah Ocalan hatiye nivîsandin, gihîşt ber destê xwendevanan.

Rojnamevana a Îtali Laûra Schrader ku di nava Komîteya 'ji Abdullah Ocalan re Azadî' cih digire, li ser hewldanên aştiyê yê Rêber Abdullah Ocalan ên li Girtîgeha Îmraliyê, têkildarî berxwedana li Kurdistanê ya bi fikir û felsefeya Ocalan pirtûka 'Berxwedan' amade kir. Pirtûk ji aliyê weşanxaneyê Edizzone Pünto Rosso ve hate weşandin. Nivîskara pirtûkê I Fuochi del Kurdistan (Agirê Kurdistanê), Civîlta e Verita (Şarîstani û Rasti) Laûra Schrader, bi pirtûka Berxwedan (La Resistenze del Popolo Kurdo Contro il Genocidio di Erdogan) re berxwedana gelê Kurd a li dijî qirkeriya Erdogan nixand. Nivîskar di pirtûka Berxwedan de cih dide berxwedana li ser fikir û felsefeya Rêber Abdullah Ocalan ku ji aliyê gelê Kurd ve li dijî şerê

**LA RESISTENZA DEL POPOLO KURDO CONTRO IL GENOCIDIO DI ERDOGAN**



îmhyayê yê topyekûn tê meşandin. Nivîskar jiyân û têkoşîna Rêber Abdullah Ocalan bi berfirehî dinirxîne û destnîşan dîke ku di şexsê Rêber Abdullah Ocalan de li hemberî bi milyonan Kurdan tecrîd tê ferzkirin. Nivîskar serhildanên gelê Kurd, şerê efsanewî yê gerîla û pêşengiya jinên Kurd a li nava şer û qada civaki bi bûyer û belgeyên şênber nîşan dide. Pirtûk qala hewldanê aştiyê ya Rêber Abdullah Ocalan ji agirbesta giştî ya sala 1993'an û vir ve dinirxîne û qala Komên Aştiyê, Civînên Oslo û peyama li Newroza

Sudoku: Bersiv 36										Sudoku:Pirs 37									
7	3	1	9	6	2	8	4	5											5
2	6	9	4	5	8	1	7	3						8					7
5	4	8	1	7	3	2	9	6		5	8	1							6
6	5	2	3	1	9	7	8	4		6	2		1	9					4
8	1	4	6	2	7	3	5	9			4				3				
9	7	3	5	8	4	6	2	1		9			5	8			6		1
3	8	5	2	4	6	9	1	7		3					6	9			7
4	9	7	8	3	1	5	6	2			9		8						
1	2	6	7	9	5	4	3	8		1		7							4

**FERHENGA BIWÊJAN**

- Ser û çav lê kirin ka:** - Pir lê xist.
- Tirşika wî derxistin:** - Pir lê xistin.
- Virtoqên me di devê me re derketin:** - Em pir êşyan, me pir eziyet dît.
- Virtoqên me di devê me de anin:** - Em perîşan kirin; em xistin tengayîyên mezin; em pir êşandin.
- Wê di derziya teng re derbas bike:** - Wê pir biêşîne.
- Wî xwe anî wî qasî:** - Ew bû sedem ku wisa hat serê wî; tiştê hafî serê wî heq kiribû, lêdan heq kiribû.
- Wî xwe anî lêdanê:** - Bi heman wateyê.
- Xwîna wî anî ser pênc pereyan:** - Rexneyên pir giran lê kirin; rezil kir, kirinên wî tev eşkere kirin
- LI SER KESÊ QENC Û QENCIYÊ**
- Bila bizmara te di diwarê te de be:** - Destpêkê qenciye bi mirovên xwe bike.
- Bizmarek lê xist:** - Agahdar kir; ji riya xwar vegehand.
- Destê xwe kesek bike:** - Qenciyeke bike. (Dema ye tiştekî ji yekî dixwaze hingê bi kar tîne. Ango tuyê bibî weke mirovekî seyid. Seyid şaşikên kesek didin serê xwe)
- Hingivê debeyî ye (Dobe) di eyarê kûçik de ye:** - Ew bixwe pir baş e, lê yê li derdora wî pir xirab in; ew der ne cihê wî ye.
- Koro tu li min binêre bi çavekî, ezê li te binêrim bi her du çavan:** - Tu qenciye li min bikî ezê pirtir bikim. Li mala xwe rûniştîye. - Tevî karê ti kesî nabe; mirovekî bêzerer e.
- Ma tu hafî agir bi deyn bibî:** - Tiştê tu dixwazî tu dikarî bêminet bibî; tiştê tu dixwazî erkekî mirovî ye ku ez pêk binim.
- Nanê mêran li mêran bideyan e:** - Dinya bi danûstandinê dibe; yek bi yekê ye.
- Nebe dû bibe Dûstan:** - Xirabiyê neke qenciye bike. (Dûstan: Hesnokê tifikê; ji bo ku qoçxane bisekine datînin ser her du milên tifikê)
- Nûr ji rûyê wî dibare:** - Pir qenc e; pir baş e.
- Qetekî bixwe, nanekî bide xêra wî:** - Qenciya wî li ser te pir e; ew bû sedem ku te zerer nedît; ew bû sedem ku tu bi ser ketî. Sifreya ku mirov li ser xwarinê dixwe, kêrê lê naxe. - Kesê qenciya wî digihe mirov, divê zererê nediyê.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

**'Şerm e ji cihanê re ku PKK'ê xistine lîsteya terorê'**



Endamê PYD'ê ya bajarê Qamişlo, Ebdkerîm Ebdilrehman diyar kir ku hêzên desthilatar yê cihanî bi awayekî derzagonî û ji bo berjewendiyên xwe PKK'ê xistin Lîsteya Terorê, herwiha daz zanîn ku PKK'ê temsîla gelê azadixwaz û demokratîk yê cihanêdike û wiha got: "Bi têkoşîna gerilayên azadiyê û gelê kurd yê ku vîna xwe ji felsefeya Rêber Apo girtine, wê PKK'ê bi ser biveke û azadiya fizîkî ya Rêber Apo pêk were û gelê kurd ji bighêje azadiyê."R-5



**Weqfa Jin a Mexmûrê ji bo jinan derfetên kar diafirîne**

Weqfa Jin a Wargeha Penaberan a Şehîd Ruştem Cûdî Mexmûrê ku jinan di hemû aliyên jiyânê de bi rêxistin dîke, bi projeyên cuda derfetên kar dide jinên wargehê.R-2



**Xemxurê wêjeya kurdî, helbestvan û şanonivîs Beşîrê Mele Newaf**

Şanonivîs û helbestvanê kurd Newafê Mele Beşîr ji sala 1978'an ve û heta niha, ji bo pêşxistina ziman, helebest û şanoya kurdî gelek xebatên rewşenbîrî û hunerî yê giranbuha daye meşandin, tevî hemû zehmetiyan jî berhemên bi nîrx çapkirin e.R-7

Cinsiyetparêzî pirsgrêka herî mezin e  
Nehîr pale R-2

Divê mafê mirovan ji berjewendiyên siyasî dûr bixin  
Dilyar Cizîrî R-4

Bila Netanyahu bê darizandin, Erdogan bê xelatkirin!  
Zekî Bedran R-5


Pirtûkên Rêber Apo  
Farûk Sakîk R-5

Giringiya civakbûyîne  
Rohat Bulut R-6

Der barê tevgera wergerandinê de cend têbînî  
Kemal Necim R-7

**Li seranserê cihanê pirtûkên Abdullah Ocalan hatin xwendin**

Di çarçoveya pêngava "Ji Abdullah Ocalan re azadî ji pirsgrêka Kurd re çareseriya siyasî" dostên Kurdan li gelek navendên cihanê, çalakiyên "Rojên Xwendina Pirtûkên Abdullah Ocalan" li dar xistin.R-3



**LI HEMBERÎ DORPÊÇ Û QIRKIRINÊ BERXWEDANA GEL GIHIŞTIYE LÛTKEYÊ**

Li ser gelê Efrînê qirkirineke bê navber dewam dîke. Dewleta Tirk a dagirker ji destpêka dagirkirina Efrînê û heta neha bi alikariya hin rêxistinên ixwanî guhertina demografîk li Efrînê dide meşandin. Dagirkerî niha jî dixwaze bi riya bicihkirina Îxwanciyan li Efrînê planên xwe dewam bike. Li aliyekî din jî, ji destpêka derbasbûna gelê Efrînê ji herêma Şehbayê re, gel di bin dorpêça hikumeta Şamê de zehmetiyên mezin dikşîne. Bi girankirina dorpêça li ser herêma Şehbayê re, jiyân bi giştî raweştiya ye û her ku diçe rê li ber karîseteke mirovî vedibe.R-6



**'Armanca KNK'ê avakirina hevrêziya kurdî ye'**


Cîgira hevseroktiya Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê(KNK) Hêvî Mîstefa da zanîn ku KNK'ê ji bo hevrêziya kurdî û çareserkerina doza gelê kurd hat avakirin. Herwiha Hêvî bang li gelê kurd û partiyên siyasî kir ku ji bo Lozaneke din dubare nebe divê lihevkerin û yekrêziya kurdî pêk bê.R-4



# Weqfa Jin a Mexmûrê ji bo jinan derfetên kar diafirîne

Weqfa Jin a Wargeha Penaberan a Şehîd Rûstem Cûdî Mexmûrê ku jinan di hemû aliyên jiyanê de bi rêxistin dike, bi projeyên cuda derfetên kar dide jinên wargehê.

Xelkê wargeha penaberan a Mexmûrê ku di salên 90'î de ji ber zilma dewleta Tirk koçî Başûrê Kurdistanê bûn, di her warê ku lê bi cih bûne de sazibûn û rêxistinbûna xwe ava kirine. Herî dawî dema li wargeha Mexmûrê bi cih dibin, dest bi avakirina saziyan kirin û rêxistinbûna xwe çêkirin. Yek ji saziyên hatine avakirin jî Weqfa Jin e. Weqfa Jin ya wargeha Mexmûr di sala 2002'an de hatîye avakirin. Weqfa jinan a ku ji sala 2002'an ve di meriyetê de ye, ji bo jinan derfetên kar bi pêş dixê. Di bingeha saziyê de beşên wek dibistan, dirûnxane, çand, atolyeyên karên dest û wêne cih digirin. Di wan beşan de jî herî zêde jin cihê xwe digrin û kar dikin.



### 3 dewreyên perwerdê yê dirûtîne hatin vekirin

Armanca Weqfa Jin ew e ku jinan di hemû aliyên de bi rêxistin bike, ji bo jinên ku pirsgirêkên wan hene çareseriyên bibîne û ji bo ku jin bi-karibin hêza xwe bibînin û nas bikin derfetên kar dide wan. Girêdayî wê salane di hemû beşan de perwerdeyan li dar dixê. Di nava sala 2023'an de 3 dewreyên perwerdeya dirûtîne da destpêkirin. Gelek jinên wargehê beşdarî dewreyê bûn û xwe di aliyê dirûtîne de bi pêş xistin. Her wiha Weqfa Jinê hem ji bo pêşxistin hem jî belavkirina çanda Kurdî projeyan pêşkêş dike û bi welatên derve re dikeve nava pêwendiyên. Herî dawî jî aliyê jinên Kurd ên li Danîmarkayê ve projeyek pêşkêşî Weqfa Jin ya li wargeha Mexmûrê hat kirin. Di vê projeyê de 16 jinên ku di dewreyên perwerdeyan dirûtîne de xwe bi pêş xistine cih digirin. Hinek jin li dirûnxanê, hinek jî ji ber nebûna derfetan di malên xwe de kar dikin. Armanca bi projeyê ew e

## Dewleta Îranê nehişt malbata Jîna Emînî Xelata Sakharov wergire

Hêzên dewleta Îranê rê neda malbata Jîna Emînî biçê Fransayê da ku beşdarî şahiya pêşkêşkirina Xelata Sakharov bibe ku dane Jîna Emînî. Malpera Îran International daxuyand ku dema Amced Emînî, Mozkan Fexarî û Aşkan Xemînî çûn Balafirgeha Tehranê da ku biçin Fransayê, hatin agahdarkirin ku qedexe ye ew ji wê hat derkevin. Malbata Jîna Emînî, ji bo beşdariya şahiya li Fransayê ku Xelata Sakharov a Azadiya Ramanê dane Jîna Emînî wergirin, lê desthilatdarên Îranê rê neda wan ku biçin. Parlamentoya Ewropayê di 7'ê Cotmehê de ragihandib ku Xelata Sakharov dane Jîna Emînî û tevgera 'Jin, Jiyan, Azadî'.



Jîna Emînî di nivê Îlona 2022'an de bi hinceta desmal nedaye serê xwe, bi destê polîsên Îranê hatibû qetilkirin. Ji ber wê bi pêşengiya jinan û dirûşma 'Jin, Jiyan, Azadî' xwepêşandanên girseyî hatibûn lidarxistin. Salane Xelata Sakharov didin kesayet, rêxistin û komên li dijî zor û zilmê disekinin.

### 'Ji ber rêgiriya heyî bi qasî em dixwazin karê me aktîf nabe'

Qîmet Kiliñç di dawiya axaftina xwe anî ziman ku di beşên din ên Weqfa Jin de projeyên cuda jî bi pêş dixin û got: "Beşên Weqfê heyî cuda hene, girêdayî van beşan jî gelek projeyên me yêna cuda hene û me pêşkêş kirine. Di aliyê atolye, hunerên dest, tenduristî û yêna din de me proje amade kirine û li ser wan projeyan xebat hene. Di salên dawî de ji ber rêgiriya heyî bi qasî me xwest karê me aktîf nebû. Me îsal hedefek da pêşiya xwe ji bo em van pirsgirêkên heyî derbas bikin. Herî zêde jî me hewl daye ku em serlêdanên navneteweyî bikin da ku Weqfa Jin bidin qebûlkirin û kar û xebatên wê bidin nasîn."

### 'Hedefa me ew e ku em zêdetir bi jinan re bibin alîkar'

Qîmet Kiliñç di nava axaftinê xwe de destnîşan kir ku armanca sereke ya Weqfa Jinê ya wargehê ew e ku jinan bi rêxistin bikin û beşdarî civaka xwe bikin û wiha got: "Li ser wê esasê me jî proje pejiwand û dest pê kir. Nêzî 16 jin di vê projeyê de cih digrin. Armanca ew e ku em bi van jinan re di aliyê aborî, civakî û derûnî de bibin alîkar. Nêzî 150 cilên çanda Kurdî hatine dirûtin, ev cil jî yêna herêmên cuda cuda ne. Piştî ku me karê xwe bi dawî kir em ê jî cihên pêwîst re ku projeyê pêşkêşî me kirin re bişînin. Dema ku mirov jî Kurdistanê derdikeve bixwazî nexwazî di aliyê ziman û çandî de bandorek çêdibe.

Wan jî li ser vî esasî projeyê pêşkêşî me kir û daxwaza wan a sereke ew e ku rêxistinkirina jinan re mijûl dibin û bi jinan re eleqedar dibin re şandine. Di nava van projeyan de ev projeya me hat qebûlkirin. Bi vê projeyê jî taybetî jî derve wek welatên Ewropayê jî bo ku çanda Kurdî neyê jibîrkirin em karê xwe dikin. Di heman demê de jî

Dersîm Nayir di dawiya axaftina xwe de bang li jinan kir û got: "Jinên ciwan divê di hemû warê de xwe bi rêxistin bikin û bi pêş bixin. Bêyî ku ji kasek din alîkariyê bixwazin divê bi xwe karê xwe bikin û xwe birêve bibin. Dikarin di çand, huner û berhemên di dest tînan çêkin, wêna û cilên çanda Kurdî angoyê dikarin di hemû aliyên de xwe bi pêş bixin."

## Di meha mijdarê de 36 jin hatin qetilkirin

Di meha mijdarê de 36 jin hat qetilkirin û mirina 23 jinan bi guman e, 4 zarok hatin qetilkirin û 7 jin jî ji kuştinê rizgar bûn. Li gorî daneyên ku JINNES'ê kom kirine di meha mijdarê de Li Kurdistanê Tirkiyeyê 36 jin û 6 zarok hatin qetilkirin. Mirina 23 jinan jî bi guman e. Her wiha 7 jin jî ji kuştinê rizgar bûn. Her wiha daneyên derbarê şideta li hemberî jinan û qetilkirina jinan rastiyê nîşan nade hejmar hejî bêtire. Qetilkirina jinan û şideta li hemberî jinan bi polîtîka û gotinên îktidarê ve girêdayî ye. Polîtîkayên bêcezaştinê jî rê li ber qetilkirin û şidetê vedike. Li gel şert û mercên xirab ên li herêma erdhejê piştewaniya di navbera jinan de mezin bû, ligel wê jî bûn hedefa îktidar û mîran. Bi taybetî di meha

Ji Pênûsa Jin	
	<b>Cinsiyetparêzî pirsgrêka herî mezin e</b>
Nehir Pale	

Gelo pirsgrêkên jin çi ne? Em li gund û bajaran dijîn, hinek jî me temenê wan biçûkin, hinek ciwanin, ên temenê wan navîn û mezin jî hene. Erdnîgariya em lê dimînin an çole, yan çiyayî ye yan jî deşt e. Cîvak cinsiyetparêz e, her çiqaşî şoreş çêdibin lê di mijara jinê de heman hişmendî û feraset hene. Tişta ku ez dixwazim bibêjim hemû jin rojane bi şikandinê re derbas dibin. Hinek jî me li xwe mûkir tîna ku şikêstina û hewl didin xwe jî bandora heymîna ya şikandinê rizgar bikin, hejmarê mezin a jinan heye ku li xwe mûkir nayên û deşt bi tîkoşinê nakin. Rewşa xwe ji ya hemû jinên baştir dibînin û koletîya di nav de fetisîna mîna azadiyê pênase dikin.

Lê sîstema dewletê bi riya malbatê, sazî, dibîstan û zanîngehan di bin navê ol de her tim hewl daye ku jineke kole û zeyif ava bike, eger bertekên jin li hemberî wê yekê derbibe û wê rastî tûndiyê were û jiyankirinê lê bikin jehr. Di encama wê yekê de bi hezarên jin mirin ji xwe re çareserî dîtin.

Li herêmên dagirkirî bi taybet Efrînê rojane agahî hene ku jin hatine kuştin an destê dirêjî li wan hatîye kirin. Roja 10'ê kanûnê 2023'an li taxa Eşrefiyê ya Efrînê çeteyekî gurûpa Hemzat a girêdayî Tirkiyê jinekê qetîl dike, di heman rojê de li ser rîya di navbera Efrîn û Ezaazê de cenazeyê jineke ku nasnameya wê nediyare hatîye dîtin. Dema ku merî destê dirêjî jinê dikin, em dajmî jî tûndiyê lê dikin, ne tenê ew sîcedar in. Cîvak berî wan sîcedar e û zihniyeta civakê ya cinsiyetparêzê dibe sedema ku tûndî li ser jinê were meşandin û her roj di encama wê de bûyêrên gelekî giran biqewimînin. Eger civak zihniyeta xwe nede guhertin û dawî li zihniyeta mîrî neyê, pirsgrêka cinsiyetparêziyê nayê çareser kirin. Li hemberî cinsiyetparêziyê tîkoşîn kirin erka hemû jina ye.

Jin jî dema 4000 BZ heyanî roja îro li hemberî zihniyeta mîrî cinsiyetparêziyê li ber xwe dide û tîdîkoşe. Destpêkê li ser asta kesayetan xwedi bertek û helwest bû piştê jî sala 1848'an destpêkir xwe birêxistin dike. Piştî avakirina Tevgera Jin sala 1998'an êdî tîkoşîna jin berfirehtir dibe û bûye ser asta cihani. Di nava civakê de eger tenê kesên di tevgerê û rêxistinên jin de çiyê xwe digrin tîbîkoşîn dîse wê tîrê neke. Ji bo pirsgrêkên jin werin çareser kirin divê hemû jin çiyê xwe di nava tîkoşinê de bigirin. Fikir û ruhê xwe jî koletî û şikêstîna rizgar kirin, dibe ku wezîfeya yekemîna jî me tîxweşlin. Wate û naveroka hinek tîgehên mîna fedîbuyîn dibe were guhertin. Jina kole divê fedî bike ne lêgerwana azadiyê fedî bike û bitirse. Sûma em girîngî bidin şêkil em girîngiyê bidin cewherê xwe, şûma em mîrî pîroz bibînin em daxwaza wekhevîya di navbera jin û mîrê de bikin. Êdî cûdahî nexin navbera jin û mîrê de, jinê biçûk nebinin û mîr jî di çavên xwe de mezin nekin. Li ser zihniyeta mîrê berdeuwamiya jiyane ne mecbûriyete û divê were guhertin.



Adarê de şideta li hemberî jinan zêde bû. Ji ber kêmasiya mekanîzmayan jinan nekarin gîfî bikin û dengê xwe bilind bikin. Her wiha li herêma erdhejê zarok jî para xwe ji şidetê girtin û bi her awayî bêparastin hatin hiştin. Li Stenbolê 9, li Muglayê 3 li İzmirê 2, li Bûrsayê 2, li Çankiriyê 2, li Konyayê 2, li Mêrdînê 2, Manîsayê 2, li Kocaeliyê 2, li Edeneyê 2, li Kayseriyê jinek, li Rihayê jinek, li Balikesirê jinek, li Têkirdagê jinek, li Antalyayê jinek, li Enqerê jinek, li Meletî jinek û li Denizliyê jî jinek hat qetilkirin.

# Xemxurê wêjeya kurdî, helbestvan û şanonivîs Beşîrê Mele Newaf

Şanonivîs û helbestvanê kurd Newafê Mele Beşîr ji sala 1978'an ve û heta niha, ji bo pêşxistina ziman, helebest û şanoya kurdî gelek xebatên rewşenbîrî û hunerî yêna giranbuha daye meşandin, tevî hemû zehmetiya jî berhemên bi nîrx çapkirin e.

### Hemza Sêvo/ Qamişlo



elektrîkê vedike. Piştî salên 1980'î û bi avabûna Tevgera Rizgariya Netewî ya Kurdistanê, re li Rojava geşedanek di warê rewşenbîrî, siyasî û hunerî de çêbû. Beşîr û çend kesên din jî li Amûdê yekmîna koma hunerî ya bi navê Serxwebûn ava kirin û di cejnên Newrozan de şano pêşkêşî dikirin. Mele Newaf li Rojava mijûlî karê zimanê kurdî jî dibû, herwiha ew yek jî damezrînerê Saziya Zimanê Kurdî (SZK) ye ya ku di sala 2007'an de hat avakirin bû. Herwiha ji sala 2017'an ve li Zanîngeha Rojava karê mamostetiya di Beşa Wêjeya Kurdî de dike û yek jî endamên Komîteya Amadekar ya Pêşangeha Yekta AŞANê ya Şanoyê ye. Di heman demê de jî endamê Yekîtiya Werşênberan a herêma Cizîrê ye. Newafê Mele Beşîr derbarê jiyana xwe û berbatên xwe yêna hunerî, jî rojnâmeya me re axivî. Xebata wî di warê helbest û şanoyê de Şanonivîs Beşîrê Mele Newaf tîklardî xebata xwe ya şanonivîsî û helbestnivîsî de wiha axivî: "Di zaroktiya xwe de bandora helbestên Cegerxwîn li min bûbûn, di heman demê de jî malbata min û bi taybet bavê min timî helbestên Cegerxwîn, Melayê Cizîrî û Ehmêdê Xanî dixwendin. Ez wiha mijûlî aliyê wêjeyî bûm û di 8 saliya xwe de ez li ser

destê apê xwe fêrî zimanê kurdî bûme. Di sala 1978'an de min yekem helbest nivîsand, ev helbest jî li ser Cegerxwîn bû, lewma Seydayê Cegerxwîn pêşwaziya min kir û min ew dît û helbesta min jî xwend. Jê û bi şûnde min dest bi nivîsina helbest û deqên şanoyê kir, piraniya nivîsên helbest û şanoyê li ser wate, şoreş, rewşa gelê kurd bûn, min di sala 2006'an de pirtûkekê şanoyê bi navê 'Kî Memo Dikuje' çap kir. Ev berhem bi kurdî bû lê ji ber pirsgrêkê teknîkî wînda bû û ber bi zimanê erebî ve hate wergerandin û çapkirin. Herwiha di destpêka şoreşê de min pirtûkekê şanoyê ya din bi navê 'Girêka Kor' çap kir û li Amedê karê zimanê kurdî jî dibû, herwiha ew yek jî damezrînerê Saziya Zimanê Kurdî (SZK) ye ya ku di sala 2007'an de hat avakirin bû. Herwiha ji sala 2017'an ve li Zanîngeha Rojava karê mamostetiya di Beşa Wêjeya Kurdî de dike û yek jî endamên Komîteya Amadekar ya Pêşangeha Yekta AŞANê ya Şanoyê ye. Di heman demê de jî endamê Yekîtiya Werşênberan a herêma Cizîrê ye.

Mele Newaf di derbarê pîrsa şanoyê de wiha got: "Dîroka şano berî helbest û şanoyê ye, angoyê ku regezên bingehîn jî şanoyê re hatin danîn şano hebû. Şanoya bi regez li cem bavê şanoyê yê Yûnanî 'Asxîlo' destpê kir. Lê dîrok û tove wê hunerê bîriya vedîtina zimanê mirovan heyê ev jî vedgere serdema livên bedenê û qiran a ku mirov pê destpê kir. Nimûne em dikarin bînin mirovê berê yêna ku derdiketin nêçîrê, herwiha vedigeriya nav civakê û tiştên ku didîtin di gîra xwe de, bi qîr û livên bedenê şîrove dikirin, di bingeha

xwe de şano bû. Destpêkê şano bi awayekî helbestî dihat nivîsandin û piştî pêvajoyeke domdar jî demê êdî bi şeweyê peşanî hat nivîsîn. Şano bi dayika hunerîna tê naskirin, hem huner e û hem jî wêje ye. Cihana herî mezin dest bi nivîsina nivîskî kevn e, tê zanin ku beşek ji Destana Gilgamêş ya Sumerî, di nav berhemên edebî yêna herî kevnar ên naskirî de, ji hezarsala duyem a berî zayînê ve li çend zimanên Asyayî hatîye wergerandin. Em di wê nivîsê de behsa girîngiya wergerê jî bo çanda civakan û gelan nakin. Em ê behsa wê mijarê li gorî rewşê û halê civaka xwe bikin.

Tê zanin ku jî ber sedemên qedexekirina çewisanînê xebatên wergera bo zimanê Kurdî yan jî zimanê Kurdî bo zimanên din ên cihanê ne bûye rûdan û kar û neketiyê rojê rojê. Hin hewildanên takekesane eger peyda bibin jî mirov nikare wan weke tevgera wergerandinê bide nasîn. Li Rojavayê Kurdistanê di deh salên dawîn de li gîştî tevgerên dahênan, xwendin û nivîsina bi zimanê kurdî geş bûye, her wiha perwerdeya fermî jî li dibîstanên û zanîngeha bûye bi zimanê Kurdî. Di rewşekê wiha de pîrsa kêmûbîna jêderên hinbûn, zîban, lêkolîn û lêgerînê yêna bi zimanê Kurdî kêm in derdikeve pêşberî me, angoyê dîpêdîvî bi çavkaniyên zanistî, ramyarî, felsefî û wêjeyî yêna cihani bi zimanê Kurdî heyê. Li aliyekî din jî, êdî pêdîvî heyê ku gelên cîran û yêna cihanê jî zanibin ka Kurd çi dinivîsin, der barê rewşa xwe de çî dibêjin, asta wêjeya wan û derbirina wan gihîştîye ku, angoyê dîpêdîvî wergerandinê berhemên bi zimanê Kurdî bo zimanê cihanê jî bibe xwe. Di çend salên dawî de li Rojava bi rêya hin sazî û hin weşanxaneyan tevgerê wergerandinê pêş ketiye, her çiqaş giran û hindîk be jî lê dikare bibe bingeha tevgerê wergerandinê ya bi hêz. Lê li kîleka ve tevgerê jî camia hin pîrsên rewşa tîna bîra mirovan; mîna gelo ev werger bi zanistî û ewle û durîst tê pêkanîn lê na? Egera ve pîrsê jî çî ye, eger ew e ku werger bi xwe zanistêkê hewceyê perwerdeyê ye. Li welatên cihanê jî bo ve zanistê beşên perwerdeyê li zanîngehan tîne vekirin, da ku werger bi ewle û durîst pêk bê. Halê hazîr li ba me hijmarek berhemên ku ji zimanên biyani bo zimanê Kurdî hatine wergerandin hene, lê ev berhem hîna di tariyê de ne, angoyê saziyek an dezgehê ku ve wergerê binixîne û berawerdi deqa resen bike, tîne ye. Dibe wergerê serkêfî be, lê dibe piştî çend salan xuyan bike ku wergereke ne baş bû. Pîrsêke din jî ew e ku; ka stratejiya van saziyan a wergerê çî ye? Pêşî pêwîste em çi wergerînin bo kîjan zimanî? Lewma pîr girîng e ku di qada wergerê de tevgerêke bi sazi û dezgehê bête sazîkin, nemîna li ser mîlê hewildanên takekesane, da ku stratejiya wergerê diyar be û sopandin û çavdêrî hebe. Her wiha li zanîngeha beşên werger bo mîlê zimanên bêne vekirin da ku wergerêna pispor bêne amadekirin.

## Têbînî

**Der barê tevgera wergerandinê de çend tîbînî**

Kemal Necim

Werger, yan wergerandin yan jî wergerin, angoyê veguheztina deqekê (Text) ji zimanê resen bo zimanekî din. Werger bi serê xwe hunereke serbixwe tê dîtin, ji ber ku girêdayî afirinerî, heşa zimanê û karîna nêzîkîrîna çandana e û dîhleke ku hemû mirovahî bi hev re bigihêje hev û ji ezmunên hev sîd werbigire. Hunereke bi qasî wêjeya nivîskî kevn e, tê zanin ku beşek ji Destana Gilgamêş ya Sumerî, di nav berhemên edebî yêna herî kevnar ên naskirî de, ji hezarsala duyem a berî zayînê ve li çend zimanên Asyayî hatîye wergerandin. Em di wê nivîsê de behsa girîngiya wergerê jî bo çanda civakan û gelan nakin. Em ê behsa wê mijarê li gorî rewşê û halê civaka xwe bikin.

## Min di rojê de payîz dît



hebûna xwezayê, ev e cihana bî evîn nawelîde, ev e xwezaya yekem a bi hemû zanîna xwe, xwezaya duyemîn bê lêgerîn, bê xweşikbûn, bê hebûna xwe bî par nahêle. Li gel her însanekî/werzê salê bî wateyê jî hev cuda tîna pênasekirin. Her werzek, bi ya berî xwe û a piştî xwe re hebûna xwe bi wate dike.

Hemû jî berdeuwamên heynên hev in. Yek bê yekê nabe. Ev jî ahenga xwezayê dîde nîşandan. Xweza bi awayekî herî kamil bûyî jî mirovahiyê ber hatîye diyarkirin. Ji bo di nav ahenga gerdûnê de bibe yekpare, her roj, bi awayekî xweşikbûna xwe pêşkêş dike. Rêwîtiya Rojê yek jî sira herî mezin ya gerdûn û xwezayê







